


Bi kurtî li ser lîseya taybet 2013



Di dibistana lîseya taybet (gymnasiesärskolan) de ji bo ku xwendevanên astengdar bikaribin xwendina xwe berdewam bikin, li kar bigerin û bi awayekî çalak tevî jîyana civakî bibin hîmek baş tê danîn. Lîseya taybet herwiha mecala xwepêşdebirina şexsî jî dide.

Perwerde tevdebûna civakî teşwîq dike, şîyana şagirt ya azad-bûnê xurt dike da digel kesên din bikaribe zanyarîyan pêşkêş bike, lêbikole û bikar bîne. Lewra lîseya taybet pir fleksîbel e ango guherbar e ji bo ku şagirt li gor armancên perwerdê bikaribe xwe pêş bixe.



Bernameya lîseya taybet

Lîseya taybet ji bernameyên netewî û ferdî pêk tê. Bernameyên netewî ev in:

Bernameya ji bo birêvebirî, bazirganî û malîdarekirinê

Xwendevan li ser birêvebirî, bazirganî û malîdarekirinê zanyariyên bingehîn werdigre. Perwerde xwendevanan ji bo wek mînak wezîfeyên sivik yê birêvebirîyê, pêşkêşkirina bo piyaseyê û belgekirinê amade dike. Perwerde herwiha giraniyê dide helwesta ku xwendevan bikaribe xizmetê bide mişterîyan, bi wan re bide û bistine û hevkarîyê bike.

Bernameya xebatên estetîkî

Xwendevan li ser xebatên estetîkî û şeweyên xweîfadekirinê zanyariyên bingehîn werdigre. Di bernamê de xwendevan pêwendîdanîna bi rêya wêne, nivîs û deng diceribîne. Perwerdeya di bernamê de ne ji bo tu meslekên diyarîkirî ye, lê pêşîya xwendevan vedike da bikaribe beşdarî projeyên cuda yê hunerî bibe, xwendina xwe berdewam bike yan di beşê estetîkî de kar bike. Zanînên ku ji vir tên wergirtin di pêşdibistan û mijûlîya zarokan ya dema vala de jî dikarin bîna bikaranîn.

Bernameya ji bo milk, tesîs û avakirinê

Xwendevan li ser karê bi milk, tesîs û avakirinê zanyariyên bingehîn werdigre. Perwerde xwendevan amade dike da bikaribe wek mînak di çêkirin û lînerîna xaniyan de kar bike. Wekî din xwendevan dê bikaribe karê erdê û lînerîna parkan bike.

Bernameya ji bo lînerîna wasiteyan û karê baran

Xwendevan li ser lînerîna wasiteyan û karê baran zanyariyên bingehîn werdigre. Perwerde şagirt amade dike da bikaribe wek mînak wasite û mekîneyan tamîr bike, otomobîlan bişo û nûjen bike yan wasiteyên barkêşîyê bajo. Perwerde herwiha giraniyê dide helwesta ku xwendevan bikaribe xizmetê bide mişterîyan, bi wan re bide û bistine û hevkarîyê bike.

Bernameya ji bo karê destan û berhemdarîyê

Xwendevan li ser dîroka karê destan, teknîka karê destan û berhemdarîyê zan-
yarîyên bingeîn werdigre. Di perwerdê de şagirt fêrî bikaranîna alet û metodên
îmalatkirinê dibe. Ew herwiha zanyarîyên derbarê malzemeyên ku di meslekên
bernamê de tên bikaranîn pêş de dibe.

Bernameya ji bo otêl, restoran û firneyan

Xwendevan li ser otêl, restoran û firneyan zanyarîyên bingeîn werdigre. Per-
werde xwendevên amade dike da bikaribe karê firne û pastexaneyan, paqijîya
xwarinê, sifredanîn, xwarinçêkirin û xizmeta otêlan bike. Perwerde herwiha gi-
ranîyê dide helwesta ku xwendevan bikaribe xizmetê bide mişterîyan, bi wan re
bide û bistine û hevkarîyê bike.

Bernameya ji bo tendurustî, lênerîn û guhpêdanê

Xwendevan li ser tendurustî, lênerîn û guhpêdana di sektora dema vala û lênerînê
de zanyarîyên bingeîn werdigre. Perwerde xwendevên amade dike da bikaribe
wek mînak di beşên xwarin û sihet, guhpêdan û lênerînê de kar bike. Perwerde
herwiha giranîyê dide helwesta ku xwendevan bikaribe xizmetê bide mişterîyan,
bi wan re bide û bistine û hevkarîyê bike.

Bernameya ji bo civak, xweza û zimên

Bername berya her tiştî perwerdeya zanyarayîya civakî û zimên dide xwendevên.
Di heman demê de xwendevan dikare zanyarîyên xwe yên di beşên çapemenî û
jîngehê de berfireh bike.

Bernameya ji bo daristan, erd û heywanan

Xwendevan li ser xweza, jîngeh û teknîkên çandinîyê zanyarîyên bingeîn wer-
digre. Perwerde xwendevên amade dike da wek mînak bikaribe karê nav erdan,
der, jîngeha gîyayî, nebat û heywanan bike. Perwerde herwiha giranîyê dide hel-
westa ku xwendevan bikaribe xizmetê bide mişterîyan, bi wan re bide û bistine û
hevkarîyê bike.

Ders

Di bernameyek netewî ya bêkêmasî de şagirtêk di beşên cuda de 2 500 pûanan dixwîne. Hin ders hene ku gişt şagirtên lîseyê dixwînin. Ev ders îngilîzî, xebatên estetîk, tarîx, spor û tendurustî, matematîk, xwezazanî, olzanî, civakzanî û swêdî ye yan jî swêdîya wek zimanê duyem e.

Ji bilî van dersên hevbeş di her bernamê de dersên ji bo bernameyê hevbeş hene, ku her xwendevan di bernameyek taybetî de dixwîne û ew rengê bernameyê dîyar dîkin. Wek din jî di her bernamê de hin kursên ji bo lêhûrbûna bernamê hene. Armanca bi lêhûrbûna bernamê ew e ku xwendevan derheqê meslek yan dersekê de xwe bêhtir hîn bike.

Di hemû dersên lîseyê taybet de pilaneke dersan (ämneshplan) heye. Di pilana dersan de tê nivîsandin bê ders û kurs ji çi pêk tînin û bê çaxê şagirt dersekê temam kir divê ew çi fêr bibe.

Di perwerdê de herwiha hîlbijartîneke ferdî jî heye. Dîbistan biryarê dide bê xwendevan dikarin kîjan kursan hîlbijêrin, lê mafê herkesî ye derseke spor û tendurustî û yeke malzanî û serfkarîzanî bixwîne.



Pîvana notayan

Di bernameyên netewî de nota ji bo her kursa temambûyî tê dayîn. Eger mirov kurs bi serfirazî qedandibe mirov nota E, D, C, B yan A werdigre. Nota herî bilind A ye û ya herî kêr E ye.

Eger mirov şertên standina E neanibe cî nota ji binî nayê dayîn.

Karê lîseya taybet nîşan dide bê şagirt ji heqê wezîfeyên normal dertê yan na

Hemû şagirtên bernameyên netewî karekî lîseya taybet dikin (gymnasiesärskolearbete). Kar divê li gor armancên bernamê û perwerda xwendinê be. Karê lîseya taybet nîşan dide bê xwendevan ji heqê wezîfeyên di meslekekî xusûsî de dertê yan na. Lewra di dawîya perwerdê de mirov karê lîseya taybet dike.

Mamoste karê lîseya taybet dinirxîne û biryarê dide bê mirov serkeftîye yan na. Eger di karê lîseya tabet de mirov serkeftî be nota E distîne. Lê eger şagirt negihe hedefê mamoste nota qet nade.

Perwerdeya li cîyekî kar

Fêkirina li cîyê kar (APL) tê wateya ku xwendevan li derveyê dibistanê, li cîyekî kar xwe fêr dike. Xwendevanekî li APL zanyarîyên meslekî werdigre, xwe hînî kultura meslek dike û dibe yek ji civata cîyê kar. Lewra fêkirina li cîyê kar di bernameyên netewî de beşek sereke ji perwerdê ye. Hemû xwendevanên bernameyên netewî bi kêmasî 22 hefteyan divê biçin cîyekî kar.

Perwerdeya şagirtîyê

Di bernameyên netewî de mirov dikare perwerda şagirtîyê bibîne. Hingî mirov bi kêmasî nîvê perwerda xwe li yek yan çend cîyên kar e. Perwerdeyek şagirtîyê beramberê perwerdeyek dibistanê ye.



Bernameyên ferdî

Xwendevanên ku nikarin herin perwerda bernameyek netewî dikarin biçin bernameyek ferdî. Bernameyên ferdî van beşên dersan (ämnesområden) dihewînin nav xwe:

- Xebatên estetîkî
- Malzanîn û serfkarîzanîn
- Spor û tendurustî
- Xweza û jîngeh
- Ferd û civak
- Ziman û têkilî

Eger ji xwendevan re baş be ew herwiha dikare here praktîkê.

Beşeke dersan dikare ji beşekê bêhtir dersan bihewîne nav xwe. Ji bo her beşek dersan planek beşên dersan (ämnesområdesplan) heye. Ew mebest û armanca perwerdê teswîr dike bê divê xwendevan xwe fêrî çî bike.

Ji dêla dîploma mamoste zanyarîyên xwendevan yên bîngehîn, yên tîn xwestin û yên hûrûkûr dinirxîne. Bî vî awayî mamoste dikare daxwazan li gor şertên xwendevên biguncîne.

Di bernameyeke ferdî de mirov dikare dersên bernameya netewî û beşên dersan kombîne bike. Midûrê dibistanê biryarê dide bê mirov dikare çî kombîne bike.

Ji bo her xwendevanekî planek xwendinê

Hemû xwendevanên lîseyê xwedîyê planek xwendinê ne. Tê de ev agahî hene:

- Bê xwendevan diçe kîjan bernameyê
- Kurs yan beşên dersan ku xwendevan dê bixwîne
- Bê bernameyê tamam e, kêmkirî ye yan zêdekirî ye
- Bê di bernama tamam de kîjan kurs hene
- Bê kîjan kurs derveyî bernama netemam in
- Bê bernama kêmkirî ji kîjan kursan pêk tê û kîjan kurs jê hatine derxistin.

Belgeya lîseya taybet

Piştî perwerda bernameyên netewî û ferdî xwendevanê lîseyek taybet belgeyekê werdigre. Di wê de dinivîse bê xwendevan çi zanyarî û tecrûbeyan ji lîseya taybet bi xwe re dibe û ev agahîyên li jêr tê de cî digrin

- Bername
- Beşên ders yan kursên ku xwendevên temam kirine
- Nota
- Cîyê ku xwendevên lê kar kirîye yan praktîk
- Karê lîseya taybet



Bernameya danasînê ya dibistana lîseyê (IM)

Xwendevanên ku dibistana bingeîn qedandine dikarin biçin bernameyek danasînê, danasîna meslek, alternatîva ferdî û danasîna zimên. Bernameyên danasînê imkanên nû dide xwendevanên bê dîploma.

Danasîna meslek

Danasîna meslek (yrkesintroduktion) ji bo hemû ciwanên ku dîploma wan têra wan nake ku ew têkevin bernameyek meslekî ye. Xwendevan perwerdeyek meslekî werdigrin û piştî wê ketina bazara kar yan xwendina bernameyek meslekî hêsan dibe.

Alternatîva ferdî

Alternatîva ferdî xwendevan ji bo perwerdeyek din yan bazara kar amade dike. Perwerde ji bo ciwanên ku dîploma wan têra ketina bernameyek meslekî ya netewî nake ye û ew li gor her xwendevanekî tê şikildan.

Danasîna zimên

Danasîna zimên (språkinntroduktion) perwerdeyek wisa ye ku gelek swêdî dide ciwanên ku nû hatine Swêd. Piştî danasîna zimên xwendevan dikarin biçin perwerdeyek din, wek mînak bernameyek din ya danasînê.

Xwendevanên astengdar yan mêjîbirîndar

Perwerdeya lîseya taybet ji bo ciwanên ku dibistana bingeîn yan dibistana taybet ya bingeîn qedandine. Lê ev kes imkana wan tune şertên zanyarîyên lîseyê bînin cî ji ber ku ew astengdar in yan ji mêjîyê xwe birîndar in.

Ji bo ku biryar bê dayîn bê xwendevanek dikeve nav vê grûpa hedefkirî de yan na beledî di lêkolînên xwe de nirxandinên pedagojîk, psîko-lojîk, tibî û civakî dike. Biryara beledîyê li gor van lêkolînan tê dayîn bê xwendevan yek ji koma hedefkirî ye yan na.

Perwerdeya xwendevanên lîseya taybet ji 3 600 saetên perwerdê pêk tê. Her dersekî 60 deqe ye û ew di nava çar salan de tê dayîn. Serokê dibistanê (beledî yan ferd) biyar dide bê di her kursekê û beşek dersan de çend saet perwerde divê hebin.



ISBN: 978-91-87115-98-1
Wêneyê: Michael McLain

Skolverket